

Dîmenek ji komkujiya Dêrsimê

Rêberê Silivî

Diho, min gotareke balkêş sebarek komkujiya Dêrsimê ya sala 1937an xwend, di wê gotarê de, wêneyeke wisa hovane heye ku hestên mirov ji kokê ve dihejîne, rastiya berpîrs û qumandarên Tirk ên zikreş û şerxwaz tîne ber çavan.

Artêşa Tirk derbasî gundekî devera Dêrsimê dibe, bi gule û singoyan kê û çî dibîne dîkujê. Agir berdide malan dişewitîne û mirina reş hawîr belav dîkê... Di



nava wê hawar, girîn û qîrînê de, efserekî Tirk zarokêkî Kurd î piçûk dibîne, çawa ku bi lez ew ji ber mirinê direve.. Dê, bav, xwişk û birayên reben hatine kuştin û rivîna agir ji mala wî li hev digere bilind dibe!! Efsêr bi zimanê Tirkî gazî wî dîkê jê re dibêje "raweste kuro, were vê derê, were cem min". Dema ew piçûk dengê wî bi zimanê tirkî dibihîze, li şûn xwe dizîvire, cendirmekî dibîne, hema yekser bazdide û bê dudilî xwe tavêje nav rivîna wî agirî, xwe dîkujê û xwe naspêre efsêrê Tirk!! Efsêr, ji vê dîdarê seyr û matmayî dimîne, ji xwe re dibêje: Evî piçûkê han dilovaniya agir ji ya me Tirkan çêtir dîtiye, ew ji ber me reviya û xwe avête nava wê

dojehê!!.

Mala me ne ava be, qey me çiqas tirs xistiye dilê vî gelê reben î perîşan, me çî kiryarên hovane derheqa wî kirine?!?. Radibe şeşberê ji ber xwe dikişîne û xwe dîkujê!!.

Evê wêneya dilşewat, ji aliyekî ez xemgîn kirime, ji aliyê din ve, rewşa kuştin û talankirina ku îro li gelek gund û bajarên welatê me Sûriyê dibe tîne ber çavan, çawa ku artêşa dewleta me Sûriyê bi tang û topên xwe derbasî gund û bajarên dibe, wan dorpêç dîkê, çalakvan û azadîxwazan yek bi yek digre dîkujê û hawîr terorê belav dîkê!! Ji ber van kiryarên hovane û kuştina bi sedan zarok, jin, pîr û kalan jî, bêtir ji 10 hizar welatî sînor derbas kirine, li Urdirnê, Libnan û Tirkîyê cîwar bûne.

Tê zanîn ku berê, dema du êl diketin hember hev û dixwestin şer û kuştinê bikin, tenê ku jinek biketa navbera wan, ji ber ku jin maka jiyanê ye, cîgehekî wê yî taybet di civakê de hebûye, yekser agirê şer dihate temirandin û herdu êl ji ber hevdu radibûn. Lê sed mixabin ku îro, gule li serê jinê bi xwe dîkêve û laşê wê li kastînan dimîne!!..Zarok, paşeroja gelan û mirovatîyê, ji kuştin û mirinê bê par nema ne!!..Tu çawa çavên xwe digerinî, tu kuştin, kuştin û xwîna sor a mirovan dibînî, ma gelo berê mirovatîyê bi kû ve ye? **D.R.(11)**

*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê
me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de*